

Gilî û gazinên zarokekî

Enehîte Mûrad

Vaye dora du salan e, ku şoreşa Sûriyê dest pêkirî û hêjî ne xûya ye, ku kîngê wê bi serkeve. Encama vî temenî dirêj, pir êş ,serpêhatî , pirsgirêk û asteng di jiyana gelê Sûriyê de, hewş vedide . Vêca jî , xelkê Sûriyê bi şev û roj xemxwarê doza şoreşê ne, nemaze zarokên nazdar ku bêhitir bi şoreşê û kiryarên vê rijîmê re mijûl dibin . Lewre jî ,pir êş û janên dijwar di hundirê me de mezin dibin . Ji ber ku, jiyana hêmenî ji lîstik ,ken ,şahî , seyran , dibistan û H.W.D winda kirine , tenê zarokên Sûriya me îro di heyamên bive de , penaberî , kuştin , talan , wêran , tiris û her tişt li pêş çavên xwe dibînin . Ango jî , hiş û ramanên zarokên Sûriya me, ji temenê wan mestir in . Weke nimûne : Ji berî çend rojan min serlêdanek ji dosteke xwe re çêdikir , piştî pirs li rewş û halê wan, wê destûr dixwest ji bo çêkirina qehwê. Di wê karnavê de ,zarokê wê yê pênc- şeş salî, ku dostanî di nêvbera me de hebû, wisan jî weke hercar, min ew hembêz dikir , pê şadibûm,û li rewş û halê wî dipirsîm.Lê, pêlên xemgîniyê li ser rûyê wî baş diyar bûn . Ronî bi melûlî û keserên kûr li min dimeyzand û weha digot : Rewşa min ne baş e, ez ji vê jiyane heznakim , lewre jî , ji berî kes min bikuje an jî dîn bike, dixwezim bimirm, belkî dema ez bimrim ji vê rewşa koletiyê azad û rizgar bibim . Min bi şêtmayî guhdarî gotinên Ronî dikir raman û gotinên wî mîna xortekî bîstsalî bû . Bi dilovanî min hembêz kir û weha jê re digot : Delalê min tu çi dibêjî jiyana bi hebûna zarokan pir xweş e, ji ber ku zarok bi xwe jiyana in . Ronî bi sixêf û kerb, xwe ji hembêza min davêt û li rex min disekinî, dest û lepên xwe dihejandin û digot : Bi Xwedê Beşar Elesed bê hiş e , sed nehle li wî were ,ku şer û ceng li dar xistî û bê fedî û şerm zarokan dikuje.Tu kes

nikare me ji hovîtiya wî rizgar bike ,ya Elah ji bo çi ev ceng ? Bi Xwedê, ez dizanim ,ku li dawî ewê şermezar, riswa û rezîl bibe!! Pişt re, hêdî –hêdî ew ji kerba xwe dadiket û bi gavên giran berve min dihat, bi dengêkî nizim ji min re digot : Tu soz didî min ,ku gotinên min ji tu kesî re nebêjî ,nemaze diya min . Bi rûkî berkenî min ew hembêz dikir û destê xwe di ser serê wî re dixuşand û jê re digot : Bi soz û peyman tiştên tu bêjî, ez ji tu kesî re nabêjim nazdarê min. Tu baş dizanî ku çiqas ji te hez dikim. Hîngê pêlên rihetiye li ser rûyê wî ava dibûn û wî weha digot: Bi Xwedê, nizanim çi bikim? Pir caran dixwezim ji malê bazdim ,vaye bêtirî heyvekê ye ,ku bavê min dûrî malê ye , ez pir bîriya wî dikim, ji dengê top ,qurşîn û him-hima balefirokan ditirsim xewkim û dema radizim, xewnên bi tiris dibînim . Ez çi bêjim, hovîtiya Beşar ne bes e ,bi ser de jî kotek û lêdana diya min. Ma tu dizanî ku ev mal li ser min bûye hebis û zîndan. Nikarim bilivim diya min tim û tim dibêje dengê xwe neke , melive , huske, ezê te bikujim. Wî bi kelgirî gotinên xwe berdewam dikirin , bi Xwedê diya min jî mîna Beşar Elesed hovîtiyê li serê min dike, min har û dîn dike, û ez çawa bikim ,ew kotekên xwe ji ser min kêm nake bi sûmsiq, kulmist , şekal û sîlan jî li ser devê min dixê û dibêje eger tu ji tu kesî re bêjî ezê te bikujim. Ev rewşa min e, de ka bêje ez çi bikim ? Hîngê agir bi dilê min diket, min ew radimûsand û weha jê re digot : Kurê min ! Heyfa zarokekî mîna te ,ku êş û janên te ji temenê te pir mestir in. Lê mixabin, ev rijîma setemkar, sedema bingehîn e ji hemû asteng û pirsgirêkên me re, û dawiya zorê rûreşî ye .